

## Zanyarînameya çendzimanî ser koronayê bo kesên nûhatî

Ji kerema xwe zanyariyan bi hemû pêwendiyên xwe li kantonê re bi par ve bikin. Em dizanin bo her kesî rewşeke dijwar e û bo têgihîştin, aramî û pragmatîzmê we sipasiya we dikin.

Rêzîkname ji 2-yê Mijdarê, 2020 heya 30-ê Mijdarê, 2020 têne sepandin.

**Dibistan û zarokistan** hîn jî vekirî ne. Li dibistanan, ji pola 5em û wêdetir, divê şagirt li hewşa dibistanê û avahiya dibistanê devpêçan lêdin. Li nava klasê jî.

**Kursên zimên û dersên din ên perwerdeyê** niha di bin pêdiviyên paqijiyê de tên lidarxistin.

**Mizgeft, kilîsê û kenêse** hîn jî vekirî ne.

**Têkiliyên taybet ên kesane** gerek kêr bibin. Herî kêr 1.5 metreyan ji kesên din durr bin. Eger hûn li cihekî hevbeş dijîn, durrbûna herî kêr a 1.5 metreyan bo têkiliyên bi kesên derveyî odeya we ye.

**Kombûn:** Li qada giştî tenê bi mirovên ji malbata xwe û malbatek din re bimînin. Kombûna zêdeyî 10 kesan hem li qadên giştî û hem jî yê taybet qedexe ye. Kombûn jibo cejn û şahî û ahengan nayê qebûl nakin. Eger vêya binpê bikin, cezaê pare dikare bo we derkeve.

**Lêdana devpêçê li devera peyarêyan neçarî ye** eger durrbûna herî kêr a 1.5 metreyan ji kesên din nikarin raçav bikin.

**Serdan û sefer** tenê bo mijarên lezgîn têne kirin. Ev hem li hundur û hem jî li derveyî Almaniya tê sepandin.

**Veguhestina giştî:** Pergala veguhestina giştî niha bi asayî bi rê ve diçe. Parastina bi dapoşandina dev û poz hetanî li cihên libendêmayîne neçarî ye. Zanyariyên niha: <https://www.stadtwerke-konstanz.de/unternehmen/coronavirus/>

**Kirrîn:** Xwarin bi qasî têr û bes heye. Hemû firoşgeh, dermanfiroşî, bank, rawestgehên benzîne û postexane dê vekirî bimînin. Eger hûn nexweş bin û kesekî nas nakin bo we xwarinê bîne, kirrîna kelmelê xwarinê bo 14 rojan beraqil e.

**Xwaringeh/klûb/meyxane** niha girtî ne. Gelek caran xizmeta hilgirtin û birina xwarinê tê pêşkeş kirin.

**Serdanên bijîşkî û derman:** Beriya serdana bijîşkî, piştrast bin bo hevdîtîne telefon bikin. Eger pêdiviya we bi dermanên nusxeyan hebe (wekî ensulîn), ji bijîşkê xwe bipirsin gelo heyeû nusxeyê wergirin. Tedawiyên bijîjkî ji hêla fîzyoterapîstan, terapîstên karî û logoterapîstan hîn jî gengaz in.

**Nivîsgeha Deverê**

---

Hevdîtînen kesane dê tenê li roja ji pêş ve diyarbûyî pêk werin. Dikarin bi telefon û e-nameyan bi nivîsgehan re pêwendiyê çêbikin. Bo hemû pirsên têkildarî Koronavayrusê, îdareya deverê xetêke telefonê yê taybet daniye: Duşemî heya îniyê ji 8 sibê heya 5 piştî nîvrojê û şemiyê ji 8 sibê heya 12 nîvrojê bi hejmara 07531 800-7777.

### **Girtina cihên jiyane yên hevbeş**

Cihên jiyane yên hevbeş li deverê bo hemû serdanan girtî ne. Tenê niştecihên li wir dijîn, karmendên nivîsgeha xwecihî ya deverê û kesên bi destûra taybet dikarin biçin wir. Niha, dayîna cihên jiyane yên hevbeş dê li gor rêzikên paqijiyê were domandin.

### **Sûdên civakî**

- **Nivîsgeha Deverê:** Diyarbûna hevdîtînan bi telefonê tê kirin. Eger pirsên we hebin, ji kerema xwe bi e-name yan telefonê bi berpîrsê xwe re pêwendiyê çêbikin. Dikarin belgeyên girîng jî bişînin [ami-leistungen@LRAKN.de](mailto:ami-leistungen@LRAKN.de).
- **Jobcenter:** Eger pêwîst be, dikarin bi telefonê hevftîninê bikin. Diravê dê wekî her carê were veguhestin. Eger we ji BAMF'ê erêbûn wergirtibe û bo vêya jî ji Jobcenter'ê dirav werdigirin, pêwîst nake hûn werin Jobcenter'ê Hûn ê ji destpêka meh tê bi awayê xwebixwe ji Jobcenter'ê dirêv wergirin.
- **Dezgeha Kardayîne:** Hemû serdan betal bûne. Ji kerema xwe tenê bo lezgînbûnê telefon bikin.

### **Corona-Warn-App**

Bikaranîna Corona-Warn-App gellekî tewsiye dibe.

Eger hûn bi kesekî tûşbûyî re ketibin têlkiliya nêzîk, hûn bi vê app'ê dikarin bi awayê nenas û zû werin agahdarkirin. Her çi qasî gel pirtir Corona-Warn-App bi kar bîne, ewqasî zûtir zincîreya tûşbûnê di pêşerojê de dikare were şikandin.

Ev App'a bo daxistina belaş li App Store û Google Play heye.

### **Zanyariyên çendzimanî ser koronayê:**

- Malper: <https://www.integrationsbeauftragte.de/ib-de/amt-und-person/informationen-zum-coronavirus>
- Instagram: <https://www.instagram.com/p/B9zdgEcKUvW/>
- Twitter: <https://twitter.com/IntegrationBund/status/1239595687907594249>

Ji kerema xwe bi awayê rêkpêk bi rêya TV, radyoyê yan online nûçeyên dawîn ser Pandemiya Koronayê wergirin.

Nûvekirin: 02.11.2020